

Azadîa rastî çi ye?

Behira azadîa rastî ye heker miruv sehet baş hebit ...
da em xizmeta Xwidê u xizmeta miruvê dî bikîn ...
u da em hevvelatîet baş bîn welatê xu bîn.

Nesaxîa Şekirê

Dû Kurd hebîn. Navê êkê “Sêvê” bî u navê ya dî
“Vîn” bî. “Sêvê” li bajêrê mezin bî ye, belê ne şîa
biçite qutabxanê. Zî şî kir u bî xudana heşt biçîka. U
bîjin bî u feqîr bî u li gel kurrê xu jîa. “Vîn” nevîeka
axaî bî u gelek zêngîn bî. Şî kir u şeş biçîk hebîn.

Jîana Sêvê ji jîana Vînê gelek feriq bî, belê çar tişt li
jîanê wan rast wek êk bîn: (1) her roj gelek xwarina
Kurdî xwar [wek bab u bapîrê xu xwar], (2) her roj
rîniştî bîn u şul nedikirin, ne yê jur ve u ne yê ji der ve,
(3) her dû qelew bîn, u (4) her dû nesaxîa şekirê hebîn.

Dixturî gut Sêvê u Vîn dê gelek nesaxî dê hebin ji ber
nesaxîa şekirê. Hindek tişt li jîana xu biguhurrin.
Dixturî gut:

- Cîxara ne kêşe
- Xu ze'îf bike
- Her roj 30 deqîqa bi rê ve herre
- Rojê dû sê cara duhinî li pêt xu bide da çerimî
zivir u kelişî ne bit
- Her roj gelek avê vexu (8 perdaşa vexu)
- Gelek birincê u nanê spî NE xu
- Pitir derametî u fasolîa u baqîla u sindîa u
hinarêt tîrş bixu
- Xwarina kelandî yan firnê bixu
- Xwarina nav duhinî da qelandî NE xu
- Kêmtir duhinî di xwarina xu da bi kar bîne
- Şekirê NE ke di çayê xu da
- Şekira taybetî bi kar bîne
- Pepsîê u Kukê u şerbetê NE vexu
- Tiştê şîrîn NE xu

Sêvê guhê xu daî dixturî u hindek tişt li jîana xu
guharrt. Gut xu, “Ez dişem biguhurrim” u guharrt.
Her roj çû pîa ji der ve, yan heker cew (seqa) nexuş bî
çû selalê u xwarê derinca li mala xu. Rojê dû sê cara
duhin li pêt xu da u pêt wê ne kelişî bîn. Cîxare hêla.
Pepsî u şerbet ne vexwar u şekirê taybet bi kar îna.
Pitir av vexwar. Nanê reş pêş nanê spî ve xwar u
kêmtir birinc xwar. Goştê mirîşkê u kotilkê yê di nav
ava kelandî xwar. Wextê çû mêhvanîa malê hevalê
xu, kêmtir yan beqlawa xwar. Bes hindek tov u
fisteq dixwar pêş tiştê şîrîn ve. Heker bîrî bî hindek
zilate yan deramet yan metfînî dixwar. Kêmtir duhin
kir di xwarina xu da. Dîmahîa guharrtina wê bî piçekê
ze'îf bî u sehetê wê çetir bî. Sêvê tê ne gehişt “çawa”
ew guharrtin jîana wê dîar kir, belê sehetê wê u jîana
wê xuştir bîn. Temenê wê drêj bî u sehetê wê baş bî u
hemî nevîet xu dîtin wextê mezin bîn.

Vîn jî guhê xu daî dixturî u gut hevalê xu, “Ez parêzê
digirim.” Belê rastî çi tişt ne guharrt. Gut, “Nesîbê
min e.” Her dem cîxare kêşe. Kêmtir pîa çû çunku her
dem timbêla xu hajut bu hemî dira. Her roj Pepsî
vexwar u gelek şekir kir di çayê xu da. Gelek u gelek
birinc u nanê spî xwar, wek ji berî biçit dixturî. Kotilk
u hêk u goştê mirîşk yê di nav duhinî da qelandî xwar.
Her dem bi keyfa xu dixwar u vedixwar. (Gelek mejî
hişik bî!) Duhin ne daî pêt xu, gut zehmet bî. Welew
her dem dermanê xu xwar u her heyv çû dixturî, eşanê
Vînê ji nesaxîa şekirê zêde bî. Pêt wê gelek eşan u
çerimê pêt wê kelişîn. Hindek birîn hebîn çenebîn.
Piç piç çavê wê tarî bîn u dîtinê wê kêmtir bî. Hindek
car didanê wê gelek diarhan u pêtivî bî çû dixturî
didana bihilkêşit. Vîn têgeheştî bî u ji amadeî xilas kir
bî, belê ne vîa jîana xu biguhurrit. Wextê temenê wê
52 sala bi eşa dilî mir. Hindek biçîkê wê hêş cihêl bîn
u bê deyk mezin bîn.

Erê kê azadîa rastî hebî? Sêvê yan Vîn?

“Dîwara bu te dibêjim, bîkê guhê xu bidê.”